

**Dumahîk : Sazûmana...**

tevahiya civakê dorpêç kirin, û ra hûrmûrên biçûk ên jiyana rojane ya welatîyên Sûrî kirin bin çavdêriya xwe ya sert. Ango ew dezgeh li ser sîngê tevahiya Sûriyan bûn zinar û barê giran, û paşeroj û aso reştarî kirin.

Li sala 2000an dema ku Hafîz Esed çû diyarê heq, kurê wî Beşar jî mîna bavê xwe, bi şêweyekî awarte, cudawaz û ne rewa hat ser postê serokatiya Sûriyê.

Lê belê, serokê nû Beşar Esed posta serokatiyê bi destê hinek ji wî xortir wergirti bû, loma jî wan hinekan, wekî mafekî wan î rewa, hemû karûbarên dewletê xistin bin fermana xwe, û berhem û arzûyên dewletê yên ku hîn mabûn, dotin, û bi riya dezgehên asayîşê, dewletine veşartî yên dizekan di hundur dewletê de ava kirin.

Di hêla siyasî û rêvebirina dewletê de jî, rêbaz û rêça Hafîz Esed di hemî warên dewletê de wek xwe ma, û şêwe û alavên berê yên ne demoqrata û ne rewajî mîna berê bikar anîn.

Di vê karnavê de, ango di berdewamiya serdariya giştî ya yek partî û yek rêber de, û ji bo ku dezgeha destlata ya nû serdariya xwe biparêze û berjewendiyên xwe jî ji dest nede, wê hemî bang û daxwazên gelê Sûriyê ji bo dadmendî, wekhevî û azadiyê ku ji salan ve têne kirin, pişguh dikirin û bi darê zorê diperçiqandin.

Ev dîroka reş ya PB û destlata wî ya tekepartî û istîbdadî ku li dirêjîya nîv çerxî didome, dewleta Sûrî daxist pileyeke şaristanî ya pir nizim, û civaka wê jî gihand deraqekî pir qeyranbar û pengijî. Û dema ku li Bihara sala 2011an gelê Suriyê doza mafê xwe yê rewa ji bo azadî û rûmetê kir û serê xwe bi riya xwepêşandanên aştiyane hilda, sazûmana PB ku daketiya radeya diktoriyeta siyasî, bi şêweyên xwe yên cudawaz û pir bi awarte bersiv da, û tevahiya xaka Sûriyê bi gelê xwe re kir eniya şerekî qirêj.

Belê.. Sazûmana PB li Sûriyê ji roja binerojê de sazûmanekî cudawaz û awarte ye, ji ber ku ew bi şêweyekî cudawaz hatiye, bi awarteyî destlata daryê dike, bi awarteyî dixwaze bimîne û pir bi cudawazî û bi bêmînakî jî bersiva banga gelê xwe dide.. Loma jî, tê bawer kirin, ku eger ne bi şêweyekî cudawaz û awarte be, ev komika ku li ser destlata har û hov bûye, yaqeya gel û welêt

bernade û ji ser serê dewletê danetê.

\*\*\*\*\*

**Çilrojîya hevala Caziye**

Bi boneya derbasbûna çilrojîya koçbarkirina hevala me Çaziya Mihemed Fehîm û Cejna û Cijna Jinên Cîhanê, li Qamişlo roja 8ê Avdarê, rêxistina jinê ya partiya me ( P.Y.D.K.S) civatek li dar xist. Bi rawestandina demeke bêdeng li ser giyanê hevala Caziya û hemî pakrewanên şoreşa azadiyê li Sûriyê, civatê dest pêkir. Piştê , birek gotin û helbest hatin xwendin, jimarek ji wan destnivîsên havala Caziye bi xwe bûn. Herweha gotina rêxistina Qamişlo ya partiye û gotina malbata remetiyê jî hate xwendin. Piştî wê , hevalekê tabloyên ku hevala Caziye amedekiribûn ji beşdarên re şirove kir. Di dawiyê de, gotareke pênasînê bi roja Çîhanî ya jinê hate xwendin û ev jî deqa wê ye: Beşdarên birêz hûn bi xêr hatin...

Îro, ji bo em hevala xwe ya hêja, xebatkar, bêrewer û xwediyê dozê, ew doza ku em hemî di ber de xebatê dikin, di bîra xwe de bînin, em li vir civiyane. Me xwest ev civata me li mala hevala me be, ji ber ku me gelek civatên rêxistinî, rêxistinî û xelekên fêrbûna zimanê Kurdî li vir dikirin. Diya Kawa , weke çawa meteloka kurmancî gotiye : " Şêr şêr e, çi jin çi mêr e" bi kar tanî, bê westan wê karê xwe di nav heval û dostan de dikir û lomajî bibû cîgehê rêz û rûmetê.

Rîzdarê bi rûmet:

Xwîşk û hevala me  
di mala xebatkarê hêja  
Bavê Azad de perwerde  
bûye, ji be wê jî , ev  
heval ji çûkaniya xwe ve



bûye xwena hestekî netewî û niştimanî.

Hevala Caziye tê tim li bîra me bî, û emê ji zarok û neviyên xwe re bibêjin hevala me xebatkareke hêja bû, azadî û wekhevî daxwazên wê , pêkanîna aşî û morovatiyê ji armancên wê bûn. Em bawer in dê armancên te bi cih werin, gelê te yê Kurd mafên xwe di welatekî azad de wergire û bibe xwediyê rûmet û payeke giran.

Rêxistana jinê ya (P.Y.D.K.S) li Qamişlo